

azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxwebûnê birûmettir
tîstek nîn e. (Ho Chi Minh)*

hejmar 2

tebax 1978

Li ser şerê hindurê

KURDÎSTANA IRAQÊ

Dîsa tiving û kalaş nîkov teqiyay li Kur dîtana Îraqê, hin pêşmerge bi gullên hin pêşmergeyên din hatin kuştin. Dijminên gelê kurd, bûrjûwaziyên Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriyê ji kêf û şahiyê di firin: Kurd bihevdikeyin qet ji wan gerin, binêlin bila hin bi çekên Sûriyê, hin bi yên Iranê qira hev bin; bêy ku têkilî wan bibin ew hesabê hevûdin bibînin. Bêguman, ji hemiyar bêtir, karbidestên Bexdayê dilşa. ne. Ku Kurd hêzên hevûdin qelsbikin, li dijî siyaseta faşîsta valakirina Kurdîstanê, ya şarederkirin û sirgûna gundiyên Kurd berxwedan, şerê çekdar qels dibe, Baas dikare bi qîma xwe, li gora kêfa xwe bilive;

Sedemên vî şerê hindurî çi ye? Berî her tiştî divêt ku bê go-

tîn ku ev ne cara pêşîn bû ku alîgirên PDK a Barzanî û yên Yekitiy Nîştimanî ya Talabanî bi hev ketine Ewan berê vî şerê dawîn, du nav du salan de ji hevûdin nêzikî çil kes (bi piranî hogirên Talabanî) kuştibûn. Jibo rawestandina wan kuştin û pevçûnên hindurî, di sala 1976 an de, Sûriye ketibû nava her du aliyan, Talabanî û " Samî " (Muhemed Mahmûd Abdurreheman, " mêjî " yê PDK a Barzanî) li Londonê dûrdirêj li ser aşîti û li hev hatina navbeyna PDK û YNK axaftibûn. Dû vê yekê re, Mesûd Barzanî di dawiya 1976 an de çûbû Şamê û ew û Talabanî li ser navê Partiyên xwe, bi partiya Baasa Sûrî re peymanekî imza kiribûn jibo ku dijheviyên nava xwe bi peyivdariyan safî

kû, hêz û xurtahiya xwe bidin şerê dijî Îraqê, û heta ku ji wan tê li hemberî Îraqê hêzên xwe yek kin. Ev bû daxwaza Sûriyê ku piştê herdu aliyan jî mizdida, devê kîsik ji wan re vedikir, da ku ew şerê Îraqê bikin. Emê hinek dûrtir bibînin sedemên "xêrxwazî" û " dilxwaziya" Sûriyê jibo Kurdên Îraqê.

Ev peyman pirîcar di kulîya, lê dîsa ji likar bû, qenc xerab dimeşiya heta destpeka hezîrana dawîn. Ber bi 15 ê hezîranê, bi sedan (hin kanî dibêjin bi hezaran) pêşmergeyên PDK û YNK ê li navça ku tixûbên Tirkiye, Îran û Îraq dighêjin hîv dest bi "şerê dawîn" dikin, da ku hemberên xwe "ji binî" paqij kin. Ji her du aliyan nêzikî 40-50 kes tîn kuştin, gellekên din birîndar dibin.

Hêzên YNK dixwazin fi rekişin. Yek ji wan, di bin serokaçiya Elî Eskerî, endamê Polîtburô ya YNK, dike berbi Ama diyê here. Dora wê tê girtin, hin ji wan tîn kuştin û hinên din te vî Elî Eskerî, Tahir Elî Welî û Seyit Kaka dîl tîn girtin, dikevin lepên hêzên PDK a Barzanî.

SERECEM

| | |
|--|-------|
| Li ser şerê hindurê Kurdîstana Îraqê | r. 2 |
| Destbrakiya Barzanî û Îsraîl | r. 5 |
| Daxuyaniya Partiya Kommünîst | r. 6 |
| Destpêka Dîrokê | r. 9 |
| Qesra Evdal Xan (Keriyek di E. Çelebî) | r. 11 |
| Derdê Xesî û lêxistinê | r. 13 |
| Destpêkên Bingehî yên Felsefê | r. 14 |
| Eniya Xwendekaran | r. 15 |
| Gelê Kurd du şoreşgerên hêja winda kir | r. 16 |
| Deng û Alan | r. 18 |
| Zman-Ferhengok | r. 20 |
| Stan û Leylan | r. 22 |

Komekî din ê YNK ê jî li ser riya Zaxoyê dikeve dafika PDK yê û dîl dibe, tevî serokê xwe Dr. Xalid Said, yek ji serekên YNK ê. Di belavoka xwe ya berê navhildayî de, YNK dibêje, ku leşkerên Tirk êrişê vê hêzê han kirine û pişt re Şexmûs Kerwan, serekê eşîra zîrekî ya, wan biriyê kiriyê nav dafika PDK ê. Ev yek çiqas rast e, nayê zanîn.

Dawîne ya pêşîna vî şerê brakuj: 40-50 kuştî, gellek birîndar û bi dehan endamên YNK dîlgirtî, di nav wan de çar ji berbiçavtirîn serekên YNK ê.

Sedemên hemayî û nêzikên vî şerî? Bi awê YNK, ev komploya MIT û SAVAK ê ye ku bi destên PDK a Îraqê û bi arîkariya hin eşîrên Kurdên Tirkiyê, dixwazin şoreşa demokratîka Kurdîstanê bişkênin, hêzên ku peyda bûne bipelişînin, riya wana danûstana derva (ya Sûriyê) bibirin. Di belavoka xwe de, YNK navê Zekî Beg hildide wek serkarê MIT ê li Hekariyê ku nav di Marcit Hecî Ehmedê serekê eşîra Cigorçe dide û bi "Samî" û Savak re pîlanên şikandina hêzên YNK datîne; riya pêşmergan dide hirîn, wan dike dafikê. Dîsa

YNK dibêje ku her wekî wê PDK ê ji navçoyên Kerkûk, Silêmanî û Erbil paqij kiriyê, PDK bi birîna riya danûs-

tana derva dixwaze heyfa xwe bistîne.

Li gora Karbidestên PDK a Îraqê, hevalên Talabanî bi hêzekî xurt ve ji Îranê dihatin ku hêzên PDK ê bi derbekî paqij kin. PDK jî diviya xwe biparêze û tiştê ku pêwîst bû jibo hişkirina YNK kiriyê. PDK, YNK yê bi "caşî xulamîya MIT û Sûriyê itham dike, gava ku jibo YNK, KDP ji Savak, CIA û MIT ê re hatiye firotan.

Ev e seviya dahûrîniya (analîza) her du partiyên ku doza rizgarkirina gelê Kurdê Îraqê dikin, xwe ji vî gelî re serokatîyekî ilmî hesab dikin!

TILIYA MÎT Û SAVAK Ê?

Ku tiliya Savak û MIT ê di vî karî de heye, ev tiştêkî diyarg. Hê meqerê PDK li Îranê ye. Îdrîs Barzanî, endamê "serokitiya Derbasok" (Qiyada muweqet), li Tehranê dimîne, bi peywendiyên PDK û Îranê bilî dibe. Hêz û pêşmergeyên PDK ê ji Îranê tên û ne bi dizî. Li Îranê, fira mêşan ji ber çavê Savakê nareve, heta ku çûnehata pêşmergeyên Kurdên li Îranê bicîh bûyî nebîne. Bi çîrokê awa qeremanî gelo hê kes bawer dike?

Haya MIT a Tirkiyê ji jî her tiştî heye; hin karbidestên PDK ê riya London û Hekariyê kiriyê ne riya kaniyê, li Hekariyê xwedî meqer in, bi serekê MIT ê re radi bin rûdinên, berx sor dikin. Bi awê ku kovar "Briefing" ku li Ankara yê bi inglîzî jibo diplomatên û çapa biyanî derdikeve, MIT çavê xwe li ser çûnehata

Kurdên Îraqê, yên Barzanî û yên Talabanî, jibo sê tiştan digire.

1° Çawa be lihevhatina wan ne mimkine; ewê li ser çûnehata û riya xwe ya Tirkiyê be jî şerbikin, hevûdin qels û pûç bikin, ji talûketiyê derkevin.

2° Himin pêşgirtina van hêzan ne mimkine, ew çax çêtir e ku meriv bihêle riya wan di Tirkiyê de derbas bike da ku xurtahî, hêz û pirsîyarên wan, he bûn û milîtanên wan çêtir bîn naskirin. Ku te tiştêkî rind naskirî dikarî li wê gorê hezrê xwe bikî.

3° Bi çûnehata wana ser Tirkiyê de, berê hin hêzên Kurdên Tirkiyê, yên ku xwe biwanve girêdane, didin Îraqê, wan pûç dikin, ew jibo demekî be jî, ji Tirkiyê re nabin talûkê.

Gelo van şîretan Savak an CIA li MIT ê kiriyê? MIT a ku heta niha hin hevalan dixistin şûna hêlîna kêmaqîlan!

Di milê din de tu tiştêkî YNK ji destbira kên wa yên Sûriyê ve ne veşarî ye û Sûriyê bi kêman zêde arîkariya xwe, bi çavênriya tixûbên (Sînorên) xwe, YNK başkiriyê destê wê. Tu serxwebûna

diravî, û dendî (maddî) ya YNK nîn e, lawra serxwebûna wê ya siyasî jî tune ye. Kingê Sûriyê got na, ew na ye. Dibê YNK raweste.

Qenc xuya ye ku tiliya dewletên ku erdê Kurdîstanê li hev parkirine di şerê nava Kurdan de heye. Lê emperyalîzm, paşverûtî, Şah, MIT, Surye di ciyê xwe de, li gora kêfa xwe nikarin şerê awaha peyda

1. Binêre Belavoka YNK ku di destpêka timehê (temûzê) bi erebî û farisî derketiye.

2. Dîsa di wê belavokê de.

Destbrakiya Barzanî û Israîl

Mî bizin bi dizî gon dixwin, eşkerê dizên.

Fêşk û veşariyên serokîtiya PDKa Iraqê derdikevin ser rûyê avê, diyar dibin.

Piştî "Pike Report" a Senatoya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ku danûstanên CIA, Nixon, Kissinger, Şahê Iranê, Savak û Barzanî li ber çavên dinyayê eşkere kirin, bi wesîqa nîşandan çawa serokîtiya feodala tevgera Kurdên Iraqê qedera xelkê kurd û ya tevgerê di destpêkê de gelerî û pêşverû kirin nav lepên Şahê zorkar û faşîst, û Nixon û Kissingerê ku destên wan hê bi xwîna sedhezaren şerkarên rizgariya Viet Namê bû, va yê îcar agahwerekî (wesîqa) ku peywendiyên Barzanî û Israîl eşkere dike ku di rojnama cihû "Yediat Ahronot" a 10-5-1978 de derketiyê û ku rojnama "Jerusalem Post" a 16-5-1978 bi Inglîzî çapdike.

Di vê bendê de Eyre Eliav, endamê Kneset (Parlemento) a Israîlî û wezîrê dewletê yê kevnê Israîlê dibêje çawa di dawîya 1966an de Levi Eşkol, serokwezîrê Israîliyê hingê, wî şandî ye Kurdîstana Iraqê û çawa lê wederê rastî Barzanî hatiye. Dî bîranînên xwe de Mîrze Eliav bi qureyî dibêje çawa ew destvala biser Kurdan de neçiyê û bixwe re ji wan re nexweşxaneyekî cîguher (seyyar) birî ye. Em wisa jî

hîn dibin ku "kak Idris" jê re rehberî kiriyê û wî li çar aliyên Kurdîstanê gerandiye

MEHÊ 50.000 DOLLAR

Barzanî jê re gotiye: Ji serokwezîrê xwe re bêje ku hun brayên me ne û emê tucar kerema we bîr nekin. "Piştî vê hevûdin dîtinê Israîl me hê ji kerema xwe re 50.000 Dollarên USA dida Barzanî û jê re bi ser rîya Iranê çekên sovyetî, yên ku ji Ereban ketibû destê wê, dişand (da ku kes şika arîkariya Israîl û Amerîkayê nebe ser tevgera kurd). Di salên 1969-1972, serokîtiya PDKa Iraqê arîkariya cihû yên Iraqê, yên ku di xwazin birevin, dikir û Israîl ji nemerdî nedikir, li wê gorê qedrê wan digirt, devê kîsik bêtir vedikir, "kerema" xwe zêdetir dikir. Û bi gotînan gotinbêjan ev "kerem" hê jî dom dike.

Bilî "arîkarî" ya Savak, CIA û Israîlê bi awê ku Dr. Mahmûd, milê rastê Barzanî, di kitêboka xwe ya rexneyî (tenkîdî) dinivîsîne, Kuweyt û Erebaştan jî ji "kerem" paşre nediman. Kerema keremkara hingê zêdebû ki di şkestina tevgerê û reva serokîtiyê de, dibêje Dr. Mahmûd, 80 milyon dinarên Iraqî (nêzikî 300 milyon dollarên amerîkanî) pere civiyabû. Ev pere bi çewalan birin Iranê û jî wir jî, bi destûra Şah

Savak, derbasî Êw rûpayê kirin. Ew nihâ di banqên Swîsî, Inglîzî û Amerîkanî deradêzên. Serok, karbidest, berdevk û xulamokên wan li ser navûhesabê Kurdan pê ji xwe re kêfa xwe dikin.

"Dijminê dijminê min dostê min e. Ye ku di avê de dixeni qe li mar jî dilefe!" Bi vê felsefa keysperest û paşverû, şerê rizgariya gelê Kurd li ber çavên gelên peşverûyên dinyayê kirin polekî pînc pere, he tikandin. Kurdan kirin şûna Harkî yên Cezayîrê, şûna eskerên kirêkirî, şûna kozaxên Sahê faşîst.

Lê feodal û bûrjûwayên kurd qenc dizanin ku marekorên hovîtiya şah û emperyalîzma US bi wan ve na de. Ew jibo bi sedhezaran cotkar û xebatkarên Kurdên ku xapiyan, dev ji mal û zarûzêçê xwe berdan di rîya rizgariya Kurdîstanê de bi dilsozî û mêrxasî şer kirin, ew jibo yên ku di dema pêşsirtengiyê de serokîti di cih de hişt û revî Iranê mar in, dijmin in neyar in. Kurdên belengazên ku di şer de pêşmerge bûn û niha li beriyên Iraqê, li ku çên Iranê derbeder û perîşan in. Jibo Serok û karbidestên feodal, şer an neşer kerem dom dike.



Quncikê Marksîzmê

Daxuyaniya

KARL MARX

FRIEDRICH ENGELS

Milyar û niv meriv iro di bin rejimên ku doza marksîzmê dikin de dijîn, bi milyonan karker û xe batkar û bîrewerên (entellektuelên). Ewrûpa sermayedar, birçî û belengazên Cihana Sêyemîn jibo sazkirina sosyalîzmê şer dikin. Sedsala me, bêguman ya tekoşînên jibo sosyalîzmê û yên jibo rizgariya neteweyîyê ye.

Li Viet Namê gelekî piçûk, paşdemayî, belengaz, derefşa marksîzmê û rizgariyê bilind dike û bi sanya rêzaniya marksîst, bikar anîna teori û azînen (metodên) marksîst serê dewleta emperyalîsta xurttirîn û pêşveçûtirîn ditewîne, xwe rizgar dike. Li ku şer hebe, li ku serxwerabûn hebe, yên ku dixwazin dinya xwe fam kin, ji xwe re rêyek derxin, pêşiya xwe bibînin, teoriya marksîst bi kar tinin.

Lewra jibo rizgariya gelê kurd belavkirina marksîzmê karekî ferz û acile jibo şoreşgerên Kurd. Marksîzm bi kurdi, marksîzm jibo avakirina Kurdistanekî aza, yekbûyî sosyalîst; Kurdistanê Kar ker û cotkaran ne ya beg, axa, serrekeşîr, şêx û sermayedaran.

Di vê pirtûka piçûka ku Marx û Engels di sala 1848 an de nivîsîne bingehên destpêkiyên marksîzmê hatine raber kirin. Ev pirtûkok nasîna dîrokî, felsefî û sosyolojîka gellek cildên stûr bi zmanekî ne pir dijwar kiriye nav çend deh rûpelen. Daxuyani pirtûka ku li dinyayê bêtir hatiye xwendin, çap û belavkirin. Çibigre bi hemî zman û zaravên cihanê hatiye wergerandin: (tercime kirin). Mixabîn jiber ku bîrewerên kurdan heta niha piranî zaroyên begzade û zadeganan bû û azadiya karker û cotkara ne doza wan bû, vê afirandina hîmî nekirine kurdi.

Daxuyani ya bi ermenî û gurcî di salên 1894 û 1897 an der ketiye hê berî çend salan bi sarnî çapbûye û me tu vergerîne wê yê zanîstiyê Kurdiya kurmançî ne ditiye. Cihanîna vî karî. Li ser me marksîstên şoreşgerên Kurdistanê ferzbû. Jiber kê mîkêranîna kurdi wekî zmanekî zanîstî (ilmi) xwendina van bendan heye ku parî dijwar be, kerem kin wan bi bihna freh û arîkariya ferhengokê bixwin.

Werger

Xofekî li ser dilê Ewrûpayê diçe û tê: xofa komunîzmê. Hemî xurta-hîyên (qewetên) Ewrûpa kevnare di Hevalbendîyeke Pîroz de gihîştin hev, li

pey vê xofê ne; papa¹ û çar², Metternich³ û Guizot⁴, radîkalên Fransayê⁵ û polîsên Almanyê.

Kîjan e partiya dijekarîyê (muxalefetê) ku ji aliyê hemberên xwe yên

li karîne (iqtidarê) bi komunîzmê ne hatiye itham kirin? Kîjan e partiya dijekarîyê ku, bixwe, gazîna giran a komunîzmê bi ser dije karên ji xwe pêşve-rûtir û hemberên xwe yên paşverû de ne şandîye?

XEBATKARÊN HEMÛ WELATAN.

Partiya Komunîst



KARL MARX (1818-1883)

Ji vê yekê du fêr (ders) dertên.

Ji niha ve kommu-nîzm ji aliyê hemî xurtahîyên ewrûpayî ve weke xurtahîyekî tê nasîn.

Dem hatiye ku komunîst li rûyê hemî cihanê averû, armanc û tewînîyên (meylên) xwe diyar bikin; li hemberî çîrokên ku li ser xofa kommu-nîst tên belav kirin daxuyaniyekî partiyê bi xwe derînin.

Jibo vê armancê ye ku komunîstine ji netawahîyên (milliyetên) cihê li Londonê civiyar û daxuyaniya

an nvîsîn, bi inglîzî, fransîzî, almanî, îtalyanî, flamanî û danîmarkî weşandin.

I

RÛRJÛWA Û PROLETER

DÎROKA her civakê heta rojên me⁷ dîroka têkoşînên çîna (sinifa) ye.

Mirovê aza û kole, zadegan (esîlzade) û mirovê jirêzê, baron⁸ û serf⁹, mamosteyê Juranda¹⁰ û berdest; bi kurtî, zordest û bindest, di dijekariyekê cîwest (sabît), şerekî bêrawestînin ajotin, geh vekirî, geh veşarî, şerekî ku timî an bi veguhêrîneke şoreşgera hemî civakê an bi windabûna her du çînan di şerî digiha dawîyê.

Di demên dîrokîyên pêşîn de, em çibigre li herciyî dibîni ku civakê avabûniya xwe ya di komikên sosyalen cihê qedandiye, xwedî hilpergalîyeke (hiyerarşiyeye) gellek cihêrenga şertên civakî ye. Di Roma ya kevnare de em patrî-

sîyan û şovalyan, plebîyan û koleyan dibînin; li heyama navîn beg û pêgirtî, mamosta, berdest, serf û serde, di nav çibigre her yek ji van çînan de hilpergalîyeke taybetî.

Civaka bûrjûwaya nûjen (modern), ya li ser kambax û xopanên civaka feodal hilkirî, dijhevîyên çînan ranekir. Wê tenê çînan nû, şertên nû yên sitemê (zordestiyê), teşeyên nû yên têkoşînê anî şûna yên berê.



F. ENGELS (1820-1895)

GEL Û NETEWYÊN BİNDEST YEKBÎN !

Lêbelê, şaniya ci-hêkera dewrana me, heyama bûrjûwaziyê, sadebûnîya dijhevî-yên çîna ye. Civak hemî hingî diçe diqete nav du birên firehên dijmin, nav du çînên mezinên ku rasterast şerê hev dikin: bûrjûwazî û proleterya.

(dûmahîk heye)

1. Papa: serekê serwerê Dêra katolîk (nîşeya werger)
2. Çar: (giliya slavî ji latîntî Caesar) payeya serwerê Rûsyayê; padîşahê Rûsyaya bertî 1917 (n.w)
3. Metternich (1773 - 1859): mirovdewletê awûstiryayî. Wezîrê dervekariyê (1809), Kongra Vienna dîcîvîne (1815) û jîbo sazkirina Ewrûpaya kevneperesta monarşîk, dijî ramanên azadîyê û mafên çarenûsa xelkan dixêbîte. Yek ji sembolen kevneperestiya ewrûpayî, Metternich bi şoreşa Viennayê tê qewirandinê (nw)
4. Guizot, F. (1787-1874): mirovdewlet û dîroknasê fransîz. Pêştî, wezîrê hindurkariyê (1830), dûrayê dervekariyê û serekwezîrê Monarşîya Tirmehê, Guizot wekî parezkerê kêrdtîntî û menfatên bûrjûwaziya mezîna fransîzî şerê tevgerên reformîstî û pêşverû kir bi şoreşa 1848 an ket û dev ji siyasetê berda. (n.w.)
5. Radîkalên Fransê: di dema Monarşîya Tirmehê, tevgerê dijekariyê. Radîkal jîbo demokrasîyê û reformên civakî şer dîkirin, piştî şandîna şoreşa 1848 a û ya Komara Duwemîn ew dikevin tevî dijekariya komarxwazî ya ku li hembertî Împaratoriya Duwemîn bû. Dûre, radîkal dibin tevger û partiyekê bûrjûwaya laîk pozîtîvîstî û parezkerê xwedaniya arîzî. (nîşeya werger)
6. Bi bûrjûwazî merem (qesd) çîna sermayedarên nûjenên (modernên) ku xwedîyê navgînan (aletên) civakîyên hîlbertînyê (istîhsalê) ne û karkeran dixêbitînin. Ji proleterya merem, çîna karkerên diravgîrên nûjen ku navînan wanên hîlbertîyê nînin in û ji ber vê yekê, jîbo dîkarîbin bijîtin, wan divê hêza (qeweta) xwe ya xebatê bifroşin. (nîşeya Ergels, çapa îngilîzî ya 1888a)
7. an, ya rastîrîtin, dîroka ku bi nûtsandinan gihtîştîye me. Di 1847an de, pêşdîrok ango (yanî) dewrana civakiya ku pêşîya hemî dîroka nûstî tê, çibigre ne dihate nasîn. Ji hingê ve Haxthausen bi ser hebûna li Rûsyayê, ya xwedantîya (mîlîkiyeta) hevrayî vebû. Maurer nîşan da ku ew xwedantî hîma civakî ye, ji kîjanî hemî eşîrên alman dertên. û. berebere hate diyar kirin ku komavaya (kommûna) gundî, bi xwedaniya hevrayî ya erdê, teşeyê ya pêşîna civakê bûye ji Hindîstanê heta Îrlandayê.
- Dawî, avahiya vê civakê kommunistî destpêkî, tevî aliyên xwe yên şanker (tîptîk), bi servebûnîya kîfêkera Morgan hate raber û ronak kirin. Morgan xwezaya (tabîeta) rastîna braxweyîyê û çûna wê ya li nav eşîrê da nasîn. Bi pelîştîna van cemaetên pêşîna veqetîna civatê nav çînan cihê û dawîde dijîhev destpêdîke. Min di Jêzaya Malbatê, xwedaniya arîzî û dewletê de, çapa 2a, Stultgart, 1886, siêtiya taswîra pêvajoya vê pelastînê kir. (nîşeya Engêls, çapa îngilîzî û almanî yê 1890, 1888 an)
8. Baron (ji baro "merivê aza") payekî zadeganiyê di dewrana feodal de. Bi meznahîya war û hebûnên xwe ji şovalyê bilindtir lê ji vîkont jêrtir bû (nw)
9. Serf (ji latîntî servus "kole"). Di dema feodal de kesê ku ne xwedîyê azadiya xwe ya temamî bû, bi erdê ve girêdayî bû li pêşbertî xwedîerd hin diviyayîtyên (mecbûriyetên) wî hebûn bêşdar û sûxredarbû
10. Jurand. Di dema karcivan (korporasyonan) de gîzîrtî ya helbijartî û sundxwartî ya karcivekî; temsilkariya karcivê dîkir mafên (heqên) wê diparast û li bicihanîna pergala (nîzama) hindurî dinîhêrt. (n.w.)
11. Patrîstî (ji latîntî patricius, ji pater "peder, malxwe") Di



JI DÎROKA KURDISTANÊ

DESTPÊKA DÎROKÊ

Kurd ji ku tên ?
Gelê Kurd çawa, di çi demê de peyda bû ye? Kîjan gelkok, eşîr û nijad tekilîhev bûne jibo çêbûnîya gelê Kurd? Pêşî û kalikên Kurdan kî bûne, çi kirine? Dîroka wan, şehrezayî û çanda wan? Kurd çawa ketin bin destan? Şer û tevgerên jibo rizgariya Kurdistanê kîjan in, dîroka wan, kêmasî û xeletên wan çi nin, jê çi ders dertên?

Ev in hin ji gellek pirsên teorîkên ronak û safîkirina kîjanan jibo têgihîştin û pratîka şoreşgerên Kurdîstanê pêwîst e, ferz e. Jiber ku nasîna berê, borî (mazî) yê bikêrî têgihîştina (famkirina) niha û wêbêyê tê û zanebûna wan hêsantir dike, rîya

(Ji rûpela 9 a)

Roma kevnare de kesê ku jiber zayîna xwe ya di malekt mezin û estl, dibû endamê çîna jorîna rûniştevanên azayên Romayê û xweat maf û imtîya zan bû. (n.w.)

12. Şovalye (ji cheval "hesp") Malsweyê feodalê ku hatina warê wî dest didayê ku xwe weke leşkerekî siwart rapêçe, çekdar bike. Dûre, paya zedeganiyê ya nizm tirtin.

13. Plebt (ji latînt plebs "gel, xelk") Di Roma entîke de endamê çîna duwemîna rûniştevanan; kesê ji xelkê (n.w.)

li pêşiya me ronak dike.

Heta meriv tişte-kî nasneke nikare wê biguhêrîne; heta ku em civaka kurd, pêka hiyên (realitên) Kurdîstanê rind ne nasin emê nikaribin wan biguhêrin.

Pirsiyara Kurd ji ku tên, bêşik, di cîh kî de, bi ya mirovahî (beşeriyet) ji ku tê ve girêdayî ye.

MIROVAHÎ JI KU TÊ?

Xebatên zanistiyên dawîntir û ewlertir yên ku bi azînen (metodên) radioaktîvî tê hatine pêk anîn, diyar dikin ku emrê Erdê li dora 4,5 milyar salî ye.

Peydabûna mirovan li ser rûyê erdê ne zikê milyonek sal berê qewimiyê. Berî hingê, ji dest sermayên xurt û hişk û qeşayên ku nivê bakûrê Asya, Ewropa û Amerîkayê dinixamtin şertên zayîna jiyana mirovî tune bûn.

Mirovê destpêkî yê wê heyamê hê pir nêzikî dewaranî bû. Wekî meymûnan, ew di nav daran de tazî dijî, ji xwe re tu star ava nekiribû. Lê cihêbûna wî ya hîmî (esasî) ji dewaran ew bû ku ew destên xwe bikartanî, pê pey wengan (aletan) çêdikir, serê kevira tûj dikir jibo ku pê xwe ji dehbe, hov û dewarên kûvîyên ji xwe xurttir biparêze.

Kalikê me yê wê dewranê bi berhev kirina

me yê wê, gûz, berû, hwd.. û bi nêçîra dewarên hûr dijî. Li hemberî xurtahiyên xwezayê (tabîetê) aciz, qels, mirov hê di destpêkê de mecbûr bûn bi gihên hev, bicivin, bihev re bijîn, bihev re bixebitin û bihev re xwe biparêzin (mudafa bikin).

GARANÊN MIROVÎ

Kombûnên mirovan bi vî rengî dest pê kirin. Ji ber paşdemayîna wan, zane ji wan re "garanên mirovîyên pêşekî (iptîdaî)" dibêjin. Di vê garanê de cihêbûn, parîkirina xebatê, newekhevî, xwedaniya erd an tiştan, peywen diyên malbatî, malbat (aîle) bixwe tune bûn. Yê ku ne ji garna yekî bûna jê re dibû nêze-neyar.

Hewcedarî, têkoşîna xwe parastinê, serê jibo jiyana û nemirîna li dijî hêzên Xwezayê (tabîetê) him bi him nasîn, zanebûn rewş û şehrezayîya mirovan pêşvebir, mêjî û hişê wan ediland, wan ji dawariyê dûr kir. E ku mirov ji dawariyê berebere cihê dike xebat e. Xebata dest mêjî, geş dike, hiş û mêjî warê xabata dest fi rehtir dikin, wan xebatên nû didora xwe de dîsa nasîne zêdetir dikin, mêjî û hiş pêş ve dibin û ev diyalektîka han mirov ji nêze-dewarî, di nav dem û dewranan de digihîne gît û ge-hîneka wî ya niha.

Piştî dema jiyana nav daran, jiber guherandina şertên xweza yî, jiber zêdebûna sermayê, mirov ji daran dadikevin, ji xwe re li starên germtir û ewletir digerin, di şikeftan de dihewin. Berebere nêçîra dewarên gir (mammât kû vî yên ren, gakûvî, hwd) bi ser berhevkirina meywan dikeve.

Mirovê nûjen, yê ji dewariyê qenc çihêbûy, di vî şerê dûr û dirêj de, di vî têkî şîna bêrawestina jîbo jîyanê û jîbo e-edilandina şertên jîyanê de peyderpey di navbeyna hezarsalên 40 an û 12 an de peyda dibe, ango mirovê ku em niha nasdikin, teşeyê xwe yê neha, bi hîmî berî duwanzde hezar salan de girtibû.

Çêbûniya nijadan (irqan) jî di wê demê de destpêkiriye. Di nav deman de, şertên jîyanê guherîn, endamên "garanên mirovî" hingî zêdebûn ku ciyê ku lêbûn têra hemiyar nedukir. Hewce-dariya kombûnên nû, yên parîkirina xebatê û parastinê, merivan ji pergala "garanî" ber bi pergala eşîrî bir. Gewşînî (xsûsiyet) ya eşîrê ew e ku ew ji merivên ku ew "xweyekî" ne, meriv û biraxwe yên hev in digihîne hev, gava ku di garanê de tu peywendiyên biraxweyî nîn bû.

Gelo meriv çawa ji "xweyekî" tê. Di destpêkê de û qasî çend hezarsalan yên ku ji dîyekî dibûn, ji "xwe-

nekî" dihatin hesiban dinê. Lê herwekî hê a verûya (zihniyeta) mîr û jin peyda nebûbû, kesî bavê xwe ne jî apê xwe nas nedikir; tenê dê, xal û xatîyên xwe nas dikir. Berma-ya wê dewranê hê jî di nav zehf gelan de, mînakî di nav me Kurdan de, xal ji apan (maman) nêzîktir tî hesibandinê. Metelokekî dibêje: Xal xwarzî ya radikin, ap brazîya wînda dikin. Ji vî dewrana serdestiya jinan re di zmanê zanistiyê de maderserî (matriarka) dibêjin.

MADERSERÎ AN DEMA

-SERDESTIYA JINAN

Di vî demê de indî mirov zane agir pêxe; di star û xaniyên ku wî bixwe avakirî ye dijî, zane peywengên çêtir çêke, dest bi çîwarbûnê û kedîkirina dewaran, pehtîna xwarinê, çêkirina diz û kodikan dike. Ew di kare kevir qul ke, bî bire, hilû bike. Cotkârî, erdçînî û xwedîkirina dewaran berebere şûna berhevkirin û nêçîrê digrin. Di nava roja ku meriv têgihîşt ku dendikê meyweyê kîngê dikeve axê, hêşîn dibê, ajdide û roja ku fehmkir bixwe tov bavêje erdê, erdçînî (zî-raetê) bike, çend sedsal derbasbûne.

Hingî diçû li ser erdekî hêjmara merivan zêdetir dibû û jîbo jîyan û ziktêrkirinê bêtir xebat diviya. Hêdî hêdî parîkirina xebatê bicîh dibe. Jî jiber nefsnexweşî (hamîletî) û zarû mêjandin

pirîcar li mal dimînin, mîr bi cotkârî an bi dewarxwedîkirinê bilî dibin. Dûrê, indîkirina karên malê, zaroxwedîkirin, kevanîtî, hwd bi tevayî dikevin stûyê jinan, mîr jî karên derve dikin û jiber ku xwarinê tînin giraniya wan dinav malê de zêde dibe; çîvak ji maderseriyê berbi paderseriyê diçe.

Erdçînî di dîroka mirovahiyê de gaveke berepêş a mezin e. Ew pêşî li peravên çemên mezin peyda bûye. Ev çem Nîl (Misir), Dîcle û Fîrat (Kurdistan û Mezopotamya, îro Iraq), Indus (Hindistan), Hou-ang-ho (Çîn) ne.

Kurdistana me ya niha yek ji pêşîntîrên dergûşên şehrezayî û çanda mirovî ye. Gundê Carmo, li newala Çemçalê li Kurdistana Iraqê, ke vîntirîn gundê rohê lata navîn û nêzik, û yek ji kevintirîn gundê dinyayê ye*. Li vî navçeyê cara pêşîn se û pez kedîbûn, li ser van erdan cara pêşîn gînim, ceh, nîsk û nok hatin tovkirin.

Hingê li navdeştî Iranê, li Asya Navîn, li Erebaştanê, li Ew rûpayê û li Sibiryayê meriv bi nêçîran bi dewarxwedîkirinê dijin.

* Binêre P. J. Braidwood, *Prehistoric investigation in Iraqi Kurdistan Chicago, 1960.*

HEJMARA KU TÊ :
ÇEND GOTIN LI SER
DÎROKA MEDYA Û YA DEWLETÊN KURDÊN HEYAMA NAVÎN.

JÎ DÎROKA KURDISTANÊ

Gerokê Tirk EWLIYA ÇELEBÎ salixê Qesra EVDAL XAN dide

Gerokê Tirkayê binavûdengê sedsa la XVII° Ewliya Çelebî di salên 1652-1653 an li Kurdistanê geriyaye, pêlekî li Erzeromê û li Diyarbekirê, dûre li Wanê maye. Di rewitiya Wanê de riya wî û serdarê wî Melek Ehemmed Paşa bi Bedlîsê ketiye û li wêderê qasî deh rojan bûne mehvanê Mîrê Bedlîsê Evdal Xan.

Di gernama xwe de Ewliya dîrûdirêj qala bedewiyên Kurdistanê wê demê, pêşveçûn û avahiya xwendegah û medresan, navdariya zana, pişekar (şenekar) an debdeba ji yana beg, mîr û mîrêkên Kurd dike û welatê Kurda mîna "merkeza mantiq, felsefe û ilmên wê dewranê" salix dide.

Gelo meriv dikare heta kuderê itibarî ya xwe bi şahediya gerokan bîne, ango pêlûka (dereca) rastiyê çi ye, para nepixandî

nê kîjane? Meriv jibo nasiya dîrokê dika-re xwe bîspêre agahwerên (wesîkayên) awaha, hinek subjektîf? Bêguman Ewliya Çelebî, wekî piraniya ger namenvîsan, di uslûbê xwe de cih dide nepixandin û xweşkirinê;

gerokê çiroknvîs divê dikaribe her gav bala xwendevanê xwe bikşîne, wî bixwe ve girêde, bi xemlandin û şêrînkirina welatê dîtî, bi xwe xwezî bi de anîn. Ev yek rastê Lê dîsa jî; tu sedem nîn bû ku Ewliya, Tirkê Stembolê, li ciyê beredayî ev çend peşnê avahî û bedewiya Kurdistanê bide, heke ku Kurdistan bi rastî ne şên û ava bûna. Çima di şûna Bedlîsan Diyarbekirê, pesnê Tokat an Ankarê ne dida? Ciyê ku agir nîn be dû hilnakişê. Billî Ewliya Çelebî gerok û zaneyên ji neteweyên din jî ji ser Kurdistanê sedsalên XVII° pesindar û hişmênayî ne.

2000 cîldî bêtir kî tîbên destnîvîsî hebûn.

Ronak e ku şahidiya zanayê Ereb Xalîfa û serpêhatiyên gerokê Tirk Ewliya Çelebî hevûdin digirin, yek yê din dixurtîne û her du jî derbekî li çîrçîrok û efsaneyên "Kurdên hovên serê çiya, bê medeniyet û şehrezayî" dixin. Kurd ne tî nê cotkar û koçer bûne; wisa jî zana bûne, bi pişe (senet) zanistî, wêje (edebîyat) bilî bûne, bedewiyê, delalîyê, evîne hebandine: ji xwe re çand û şehrezayîyê ke dewlemend, biserê xwe afirandine. Çiqas bûrjuwaziyên zorkerên tirk, ecem û ereb bixwazîn van rastiyên dîrokî veşêrin, dîroka me bîdin windakirin, kî tîbê û afirandinên kurdên kevn bişewitînin jî cad û xebe ta wan tewş e: Nê dîkarîna milê kesî de ye tîrêjên rojê veşêre. Ku ew çavên xwe girtibin, paçik kiribin guhên xwe, serê xwe kiribin nav qûmê û naxwazîn rojê bibînin, ev kêmhîşî û mîjîzengariya wan, nişan dide, na be nişan: tunebûna rojê!

Me ji gernama Ewliya Çelebî keriyekî kurtê li ser Qesra Evdal Xan derxist

DI SEDSALA XVII° DE KURDISTAN WARE FELSEFE û ZANISTIYÊN XWEZAYÎ BÛ

Mînakî, zanayê mezinê sedsala XVII° dîroknvîs û gerok, ensiklopedîst Hecî Xalîfa (di 1658 an de miriye) di tenga xwe de dîniwîse: "Zanistî (ilm) li cem Tirkên Osmanî di rewacê bûn heta heyama Qanûnî Silêman (1520-

1566). Piştî, tenê li welatê Kurdan hê ji felsefe û zanistiyên xwezayî (tabîî) re hê wes hebû; zaneyên Kurd bi wan bilîdibûn û ew geşdikirin".

Li gora salixdana Hecî Xalîfa di kitêbxana Sultan Huseyn, mîrê Behdînan de, ji

JÎ DÎROKA KURDISTANÊ

Evdal Xan him Mîrê Bedlîsê bû him **yek** ji berbiçavtirîn za neyên dema xwe bû. Di kitêbxana wî de "bêhejmar kitêbên gelek giranbiha, yên ku wî bixwe civandi bû û yên ku ji kalîkên wî şeref Xan mabûn, (...), minyatûr, cewher û zînetên bêbiha" hebûn. (E. Çelebî). Bilî (xeynî) felsefe, dîrok û zman, Evdal Xan bi mekanîk û stêrnasîyê (astronomî) jî bilî biye.

Di eynî wextê de, wekî sultan û şahên heyama xwe, Mîrê Bedlîsê xwediye qesr û diwanekî têr û tije, xulam û qewraş bû, li ser piştê xebatkarên Kurd bi debdebê û seymyanekî şahane dijî. De em guh bidêrin Ewliya Çelebî jibo salixdana vê debdebê:

"Di vê qesrê de eywanekî hebû, çaralîyên wê camêkankirî bû. Ji menzela xezîne diketinê. Hemî paçeyên wê li baxçe dinêrin. Pace bi qefesên tûnc û hesinî bûn û seranser neqşandî bûn. Ev hemî diyariyên xanên farîsên Tebrîzê bûn ji Evdal Xan re."

Di nivê eywanê de, hewzekî jî sêsed avavêjkên (fiskiye) xwe ava zelaltîrîn heta qubbê hilavêt. Qewraşên ciwan hemî cariyeyên Çerkez û Gurcî bûn fistanên wan, kemîberên li piştê wan û xencerên ku ew dixemilandin, hemî

bi kevirên giranbiha û bi zînetan neqşandî, her yek ji wan bi hindikî hezar quriş dikir. Gava ku hun awaha wan, bi qapqapkên sedefkirî, di xizmetê de dibînin hunê bibêjin qey ew çivikên Bihuştê (Cennetê) ne. Ev qewraş biqedirgiraneke mestirîn pêsmalkên hevrişim û qapqapkên sedef tînin ji yên ku serê xwe dişon. Ji vê eywana camekankirî meriv dikeve yeka din, bi qubbeyeke mezin girtî, ku jê re "Eywana Hênikker" dibêjin û çar diwarên wê bi mîxan (bizmaran) xemilandî ne. Ev qubbe çendî zexm e ku bi hezeran ronîderk û awîze pêve daleqandî ne. Ji vê eywanê meriv digihê hemamê.

Gava ku meriv dikeve, dibêje qey di rohaniya esmanî de xerq dibe, jiber ku li dora vê qubba ku heta ferîşteyan (melakan) hildikişe tu şopa diwaran ne xuya ye. Qubbe çibigre bi temamî li ser stûnan avakirî ye û navbeyana stûnan bi kristal; aqût û kevirên kêmderên saftirîn û birîqoktirîn neqşandi ye, wilo ku dema ku tîrêjên rojê dikevin ser wan, hindurê hemamê bi herikandinên rengarengên roniyên delal tê dagirtin.

Di nivêkê de hewzekî mezîni bi avavêjk cih digire. Zemin ji perçeyên eqîq, feyrûz,

gewher û kevirên Ceylanê, yên wekî çavê çivîkê gir, hatiye neqşandin.

Qurne ji minê ne. Heçî kanî, ew hemî zêrîn an zîvîn in. Bi temaşa cariyeyên wekî rojê bedew ku li ser laşên xwe yên tazî pêmkên sorên hevrişimî dilefinin û bi lûfikên xwe yên ew qas xweşbîhndar bi qedirgirani bi meriv bilî (mijûl) dibîni hişê meriv dike ji serê meriv here. Bihnen delaltirîn hildi kişin ji bixûrdankên bi teşeyên cihêreng ku tê de ji her text lîti giyayên bihndar dişewitin.

Xulamên we yê aciz di çil û yek salên ku li rûyê erdê bihartibû tucar tiştekî awaha nedîtibû. Xwedê zane ev hemî bi çî bihayî bûn? Heta di hate gotin ku gava Sultan Murat, fatihê Bexdayê, hatibû xwe li vê derê bişo, gulav herikibû ji kaniyên avasê û ji kaniyên avasê germ aveke bixûrdar. Pênc reşîk di yek ji menzela de xizmeta wî kiribûn û pênc keçikên xwediye bedewiyeka bêhempa di menzelekî dîn de ihtimamên çêtirîn û delaltirîn nişî wî dabûn. Sultan Murad ew qas kêfxweş bûbû ku nikaribûye xwe ragire û qiriyaye "Çima di Dar-î Saadeta min de jî hemamêkî awaha tune ye!" Ev jî rast e.

(dûmahîk heye)

DERDÊ XESÎ Û LÊXISTINÊ

Xwendevaneka me nvî-sandina jêrîna li ser rewşa jina kurd şandiye me. Em wê bê guheran din çap dikin û hevîdarên ku ewê rojekê zûtir "derd û kulên" jinên Kurdistanê siviktir bibin, ewê wekhevîya jin û mêran saz be.

Hejmarekî AZADÎ yê ket destê min. Hun dibêjin: "Jinên Kurdistanê AZADÎ kovara we ye; pirsên xwe, derd û kulên xwe jî me re binivîsinin." Derd û kulên me pirs in; nakevin kovar û kitêban. Kîjanî bêjî kîjanî nebêjî? Dîsa ezê bi çend rêzan misalekî koletî û bindestiya jinên kurd bidim pêşçavan. Bira neslên ku tîz zanibin wextekî dê û xwişkên wan di çî halî de bû ne, çî kişandî ne çî nekîşandî ne.

Vayê çîroka min. Berî çend salan ez keçekî bûm, xwediyê gellek xewn û xeyalan li ser bextiyariyê; niha jinebî û stûxwar im li mala bavê xwe!

Berya ku ez bize-wicim, min û dergis tiyê xwe jî hev gellek hiz dikir. Ez sê-çar meha bi xwestî mam, paşê daweta me kirin bi kêf û bi dîlan. Nav malê de sê gormên min hebûn, tevî xesî û xezûrê min. Kulfetekî giran bû Bûka salê ez bûm, loma giraniya kar jî li ser stûyê min bû. Ez qewraş, bişkûrî, navmalî, kevanî bûm. Berav, fraxşûstin xwarên pehtin, karên malê, jî sibê heta êvarê ez jî kar pê re nedigihîştim; çavê min jî kar venedibû. Xwezî qenebe dilxweşî û aqûbet hebûna! Lê li kur e aqûbet? Ew bizorê mehekî dom kir. Piştî vê meha şêrîn, nava min û mêrê min berebere nexweş bû. Xesîya min nav di kurê xwe dida digotê: "jina te bi xebera min nake". Wî jî min dikir menzelekî û bi daran li min dixist.

Her wekî hun jî dizanin, welatê me da pîr tiştêkî ecêb e ku bûk jinebî vegere mala bavê xwe. Nava malê da teva gellek zordestî li min dikirin, lê min jî tîrsa dengê xwe nedikir. Min ne dixwest destê min û mêrê min jî hev bibe. Lê derdê wan ne yê kişandinê bû. Gava ku mêrê min dihate malê xesûya min fesda diya min dikir û wî jî bêpirs li min dixist, ber çavên min reş dikir, serê min dişikand. Heke yekî birînên min bidîya xesûya min digot: li erdê ketiye. Ez weke dîlekî, hêsîrekî li ber destên wa bûm. Lê evana hemî jî cahilî û nezaniya mêrê min bû. Rojekî min xwest, pêre xeber dim, bi zarekî xweş, bi awê merriyan ne bi yê hov û hirhopan, pê bidim fam kirin ku ez jî meriv im, ne kevir im; ka jî bo çî vê zordestiyê li min dikin. Enîrî, har bû, sê kevirên xwe avêt, min sand mala bavê min.

KEYO

Ey keçê rabe bixwîne da tu serbest her bijî,
Zû jî xew tû ser hilîne bes bimîne bê mêjî.

Rêncbera hundir tu yî tim rind û jîr û zane be,
Bo te bêtir her divêtin xwendewarî, paqijî.

Wa hevalên te li her cî serbilind pêşve diçin,
Rabe ser xwe ey keça kurd serbilind bijî tu jî.

Ger bixwînî dê bidî xwendin tu ê hundir teva,
Ger nexwînî kes jî bo me êş û derdan nakujî.

Wa Cegerxwîn xweş dinalî da ko jin pêşve herin,
Da bibêjin her bijî kurd her bijî kurd her bijî.

... CEGERXWÎN

Em dibihîzin û dixweynin ku li welatên din kes indî li dewara jî naxe. Lê li ba me hêhin kes jî nezani û hirhopî yê lêxistina jina mêranî hesab dikin. Ew nizanin ku mêranî iro zanîna e; çî jin çî mêr, wekî hev merivan jîndin e.

JINEKA SORESGERA
▲ KURD ▲

▲ I. ÇIMA ME DIVÊ FELSEFÊ HÎNBIN ? ▲

Em dixwazin di vê pirtûkê(kitêbê) de bingehên destpêkî yên felsefa materiyalîst⁽¹⁾ pêşkêş û raber kin.

Çima? Ji ber ku marksîzm bi awakî gellek nêzik bi felsefê ve û bi azînekî (metodekî) ve girêdayî ye; yên materiyalîzma diyalektîk. Loma hînbûna vê felsefê û vê azîne jî bo qenc têgihîştina (famkirina) marksîzmê û jî bo pûçkirina spartekên (delîlên) teoriyên bûrjûwa wisa jî jî bo ajotina têkoşîneke siyasî ya çê pêwîst e.

Lenîn gotiye: "Bê teoriya şoreşger, tevgera şoreşger çê nabe²". Berî hemî, ev, dixwaze bêje; divê teoriyê bi pratîkê ve girêdin.

Gelo pratîk çî ye? Pêk anîn e. Mînakî, sa nayî û erdçînî (zîrê et) hin teoriyan (teoriyên kîmyewî, fîzîkî û bîolojîk) pêk tînin (ango dixin nav pêkahiye, nav hebûnê).

Teorî çî ye? Ew na sîna tiştên ku em di xwazin pêk bînin.

Meriv dikare tenê pratîk be-lê hingê meriv timî bi eynî awayê hinbûyî pêktîne. Meriv dikare tenê teorîk be-lê hingê yê ku di hişde tê danîn pîrcar ne pêkanînok e? Lewra divê ku di nav teorî û pratîke de peywendiyekî hebe. Pirsiyar bemî zanîn e ka ev

teorî divê kîjan be û peywendiya wê ya digel piratîkê divê kîjan be.

Em bawer in ku ji milîtanê karker re azîneke dahûrînîyê (analîzê) û hişwerîniyê (muhakemeyê) rast divê jî bo pêkanîna keftelefteke şoreşgêra rast. Jê re azînekê divêt ku ne ol

II. HÎNBÛNA FELSEFÊ TISTEKÎ DIJWAR E ?

Giştane tê bawerîn ku hînbûna felsefê jî bo karkeran tiştêkî teji dijwarî ye, nasînen taybetî (xisûsî) dixwaze. Divê ku em mikur bê ku pirtûkên bûrjûwa bînin awakî wilo hatîne nivîsîn û çikirin ku ew wan di wan raman û bîran de teyid dikin û tenê dikarin wan jê birêvînin.

Em na xwazin diwarîyên (mişkileyên) ku bi giştî di hînbûnê de û bi taybetî, di va felsefê de

* Georges Politzer (1903-1942): *btrewer û fîlozofê markîstê şoreşgerê fransîz (bi eslê xwe macar) Yek ji pêşajoyên belavkirin û hînkirina materiyalîzma materiyalîst li Fransayê. Li Zanîngeha karkerî ya Parîsê dersên felsefeya materiyalîst da ye. Milîtanê Partiya Komunîsta Fransayê. Di sala 1942 an Alman ew ji ber xebata wî ya nav Berxwedanê dijî Nazîyan gulle kirin.*

weriyeke (dogmayeke) ku bersivên (cewabên) çêkirî û amade dide wî, lê azîneke ku kirin û şertên ku tucar nejihevin, têxe hesabê, azîneke ku tucar teoriyê ji piratîkê, hişwerîniyê ji jîyanê veneqetîne. Lewa ev azîne (metod) di nav felsefa materiyalîzma diyalektîk, hîmê marksîzmê, de ye ku em dikin raber kin.

hene înkâr bikin; lê meriv dikare bi ser van diwarîyan keve, û ew pîranî jî veyekê tê ku ew tiştên han jî bo gellek xwen devanên me nû ne.

Hê di destpêkê, de emê ji xwe gazî wan kin ku ew manayên hin gotina ku peyvîvandina rojane de guhurîne ji nûve bidin hişê xwe.

(dûmahatk heye)

¹ *Materiyalîst: ji matîrêre; dend, gewher, made. Kurdiya materyalîst dibe dendtwer, lê her wekt gotina materyalîst bûye navneteweyî, di zmanê felsefê de bicîh bûye me di şûna dendtwer de materyalîst dant (nîşeya werger)*

² *Lenîn: Que faire (Çi bikin?) Edition, Sociales 1947, r. 26*

³ *Pêkanînok! ê ku dikare bê pêkanî.*

HEJMARA KU TÊ:

FELSEFE ÇI YE?
FELSEFA MATRYALÎST ÇI YE?

ENIYA XWENDEKARAN

Ji ber kêmasiya cih û zêdebû-
na pirsên aciltir em bendên xwe
yên li ser pirsê AKSA yê û Xeba
ta Yekitiya Xwendekarên Kurdîs
tanê li Fransayê dihêlin carekî

din. Îcar tenê di karin hin kerî
yên du belavêkên li ser şerê
hindurê Kurdîstana Îraqê derketî,
di stûnên xwe de çap bikin.
A Z A D Î

Fransa

BES E HUN BÛN LEYÎSTOK JI EMPERYALÎZMÊ RE,

BES E WE XWÛNA HEV RÊT.

Gelt Hevalan! Her wekt
ku hun dizanin ji dest
pêka meha hezîranê vir
da, hinek nûçeyên li ser
şerê di nav Kurda da tê
nivîtsandin.

Em tev da dizanin diyalîzm
şerê Îrakê da jî ê ku
bi Barzant û grûba Bar
zant leyîstemperryalîzma
Amerîkayê û Faşîzma Îra
nê bû. Ewan xwûnmijên
han piçtî şkandina şore
şê dîtî ku Kurd gî ne
hatine kuştin, û armacên
wan nehatine cîh. Îro jî
dixwazin bi hinek cam
bazîyên din wan armacên
xwe pêk bînin, û Kurda
bi hev bidinkuştin û
wendakirin.

Em ji wankesên ku li
hev dixin, hev di kujin
dipirsin: Gelo hun bi
rastî bawerdikin ku ewê

Amerîka û Îran we xelas
ke? Yan hunê bi artkariya
wan Kurdîstanê azad kin?
(...) Lê ji bîr mekin ne
Şahê faşîst ne jî Emper
faşîstîzm we xelas nake. Ew
ji bo demek din jî xwe
li piya bigrin, we bert
hev didin.

Em ji wan kesan dîsa
dipirsin: Gelo hun bawê
rin ku Sûriye bi rastî
artkariya we dike û di
waze hun xwe xelaskin
Kurdîstanê azadkin?
Ku hukumeta Sûriyê bi
rastî artkariya we dike
boçî şoreşgerên Kurd di
hepîşxanên Sûriyê da ri
ziyan? Boçî bi seda Kurd
an ji Kurdîstanê sirgûn
dikin? Boçî navên gundên
Kurdîstanê dighurînin
Kurdîstanê li Fransayê
erebt? (...)

Grûbên Barzant,
grûbên Talabant! Bes
e hun jî emperyalîz-
mê re bûn leyîstok,
bes e hun li dû wan
faşîstîzm, bes e
we Kurda bi hev da
kuştin. (...)

Hevalên delal! Di-
bê ku em pir baş za-
nibin, feodalîzm, şerî
tî, begîttî, axattî ni-
karin gelê Kurd û
Kurdîstanê azadkin.

EWÊ KARKER Û COTKAR'ÊN
GELE KURD KURDÎSTANÊ
AZADKIN !

BIJÎ ŞERÊ GELE KURD BO
RIZGARIYA KURDÎSTANÊ !

BIJÎ KURDÎSTANA AZA
YEKBÛYÎ Û SOSYALÎST !

Yekitiya Xwendekarên
Kurdîstanê li Fransa.
Paris.. / 7 / 78

Berlin

Riya SERBESTÎ Û AZADÎ
yê JI NAV KOMA KARKE -
RAN DEST PÊDIKE!

Bijî Têkoşîna Gelê Kurd
jibo bicîhanîna mafê
çarenûsinê! (...)

Yekitiya Xwendekarên
Kurdîstanê li Berlînê
AKSA-B

Venîşa Azadî yê: Hevalên
Berlînê tîstên çê û hê-
ja dibêjin. Tenê du pîra
sên piçûk: 1° Kî ne ev hê
zên ku ji nîstîmanparê-
ziya wan guman tê kirin?
2° Bi wan re di bin bane-
kî, di nav komeleyekî de
civîn tîstekî rast e?

Di van rojên dawî de
xeber ji welêt tene
ku careke din şerê
Kurdan dikine (...) mê-
ran ji hev gêrdikin!
Her aliyek sûc davêje
ser aliyê din. Lê pîra
sa vî şerî xuya ye ku
bi awakî din e. Bivê
nevê destê neyaran di
vî karî de heye û tiş
teki gelek ne baş e.

Dîroka gelê Kurd di
de xuyantîkirin, ku
rizgarkirina gelê
Kurd, ya netewayettî
û çînayettî ji hev
nayên birîn; û ji ber
wilo jî çîna derebeg

û bûrjûwaziyê Kurdî
nabin ku serokayeti
ya tevgerê bikin, ew
hergav amade ne, ku
destên xwe bidin
dujminên gelê Kurd.
-Hêzên bîngehtî, ji
tevgerê re, zahmetkê
şên Kurd in-ramanên
tevgerê pîwîstîna ku
ramanên çîna karker
bin. (...)

-Hev kart li gel ew
rêjîtmên ku gelê Kurd
di perçiqîtnin ne rast
e û gava hêzektî siya
st Kurdî li gel wan
kar bike, guman dike ve
nîstîmanperweriya...

XWENDEKARÊN ŞOREŞGER YEKBÎN!

Gelê Kurd du winda kir

KURDISTANA ÎRANÊ :

AZÎZ YÛSEFÎ



Nvîskar, rojname van û şoreşgerê Kurdê hêja Azîz Yûsefî di destpêka hezîranê de li Tehranê mir. Azîz Yûsefî kevintirîn girtî yê siyasî yê Iranê bû. Li serhev BÎST Û PÊNC SAL ên jiyana xwe di zîndan û girtîgehên şahê zorkar de derbas kiribû.

Gelê kurdê Iranê bi rojan şîna Azîz Yûsefî girt. Li Mehabadê, qasî bîst hezar kes, di şertên çendî dijwarên fâşîzma şahî de, bêtirs li ser gora wî civiya; li ser şoreşgeriya wî, têkoşîna wî, gelhizî û welatparêziya wî gotar hatine gotin. Li şah, savak û xulamokên wanên ku ji mirina Azîz Yûsefî berpirsiyar in lanet barandin. Xelk diqîriya, digot: "KURD NAMIRIN! KURDISTAN NAMIRE! AZÎZ YÛSEFÎ NAMIRIN! MIRIN JIBO ZORKAR Û XWÎNXWARAN E, JIBO DIJMINÊN XELKÊ YE!" Yên ku li ser gorê bikel dipeyivîn zanibûn ku ewê bîst girtin, bîstêşandin, bîstêşandin. Lê ne tirsîyan. Kela dilê xwe ya ku li ser dilê gelê kurd civiya ye, hêdî kirin, rêtin.

Azîz Yûsefî, cara pêşîn di 1948an de, çend meh piştî peliçandina Komara Mehabadê hatibû girtin. Hingê ew hê xortekî bîst û du salî bû. Lê bi qelesa xwe bi zîndanê xwe, bi milên xwe karêkî hêja kiribû jibo komara Kurdî.

Di 1952 a de, di dema Mossadeq de ji zîndanê derket.

Sêsal şûnde dîsa tê girtin. Piştî çend meh hê azadiyê di sala 1957na de Şah dîsa Azîz Yûsefî û hevalên wî yê PDKA Iranê di girtin û dixwazehin ji wan bidardake. Lê jiber tirsê savak û xwerabûnekî nû li Kurdistanê Iranê, wî bi girtina timî dide mahkumkirinê. Ji hingê heta adara 1977an Azîz Yûsefî ji zîndanekî têşandin ya din. Borazcan, Babol, Xesser navên çend ji van sembolên hovîtî û zorkariya rejîma Şah in.

Di sala 1976an de, hevdesaziya mirovhiz Amnesty International, wî dîke "girtiyê salê" û di çapa Ewrûpayê de seferekî vedike jibo azadiya wî. Zane ye Belçîkî Pr. Louchard,

ji Zanîngeha Bruxelles ê bixwe serê têkoşîna jibo azadiya wî dikşîne, rojnamevana dişîna Iranê da wî bibînin, şertên jiyana wî bidin nasîn. Ji nûçegihanê (muhabîr) rojname "Le Soir" re Azîz Yûsefî awa dipeyive: "Ev bîst û pênc sal ku ez di zîndanê de me. Savak ji min re dibêje ji şah efû bixwaze, emê te berdî. Lê yê ku efûyê bixwazene ezim." Jibo Azîz Yûsefî ji zorkaran efû û kerem nayê xwestin, bi wan re şertê kirin. Azîz Yûsefî nexweş bû, gellek janên wî hebû dixwast were Ewrûpayê li xwe bîpîrse. Evbîst çend meh li dû pasaportekî bû. Lê şah û savak, nehiştin. Ewê mîrxasî, û şerkariya Azîz Yûsefî timî di bîra welatparêz û şoreşgerên kurd de be, navê wî jibo newşên (neslên) wêbêyê, yê Kurdistanê aza bibe yek ji sembolên meznahiya mirov li hember hêzên zorkarî, kevneperestî û tariyê.



şorêşgerê hêja

KURDISTANA TIRKIYÊ

MUHTEREM



Muhterem mir. Îcar rast e, sed mixabin! Ne wekî sala 1971an ku rojnameyên bûrjû waziya Tirk, wekî "Hürriyet" û "Milliyet", bi fîta MITê kuştina wî û çar hevalên wî di rûpelên xwe yên pêşîn de bi manşetên gir mizgîn didan: "Barzanî pênc Kurd parêz û kommunistên har da kuştin!" Îcar, ew bi rastî jî nav me çû, me terikand. Ne bi destê MITê û ne jî bi yên paşverû û kevneperestên Kurd. Lê di qezakî rê de, di meha hezîranê de.

Kurdparêz û kommunistekî çê bû Muhterem, wekî kelem bû di nav çavên hêzên kedxur û mêtîngêgehparêzên (kolonyalistên) Tirk, di nav singê sinifên serdestên Kurd, beg û axa û şêxan de. Ujî zû ve. Bi hindikî, ev bûn panzdeh sal.

Hingê, kesên ku li Kurdistanê Tirkiyê doza kurdîtiyê dikirin pirr kêmbûn; çengekî bûn. Kesî newêribû gotina Kurd bîne serzamanê xwe. Wîlo ku, serêkê sazûmana leskerî, General Gursel, yê ku bixwe jî bi

eslê xwe Kurd bû, di 1960 a de li Diyarbakirê, li pêşberî dehhezaran Kurdên civiyayî diqirîya; "Tû kin rûyê yên ku ji we re di bêjin Kurd! Hun Tirk in, Tirkên çiya!" Kesî newêribû dengê xwe derîne.

Jiber dijwariyên têkoşînê, ji tirsê girtîgeh, zîndan, kuştin, perîşanî û ji karê xwebûnê, ji kesên ku wê çaxê doza kurdîtiyê dikirin gellek veşerîyan, dest ji kefteleftê kişandin. Hin li mala xwe rûniştin bi karê xwe bilî bûn, hin bi kelûbîn xwe dan beza dewlemendbûnê, bûn milyoner xwedî mal û milk, serê hinekan di AP û CHPê de derket, hin kurdîtiyê jî xwe re kirin pêpilûk ji bo bilindbûn û ciyê xwe girtinê, hwd...

Muhterem yek ji wan kesan e ku ji doza gelê Kurd venegerîyan, hebûna xwe, wextê xwe, canê xwe dane vê riyê. Li dinê herkes tiştek dihebîne, tiştek li ber dilê wî şêrîne, yê Muhterem doza Kurdistanê bû, ya rizgariya gelê Kurd bû. Karê wî ev bû; jiyana wî jî vê bûnê bû.

Panzdeh sal in li kuderê mîtingekî, meşekî, şevêkî çandî hebûna. Li kuderê hevalekî di tengasiyê de bûna, Muhterem li wê bû. Pir caran digot: Karê hinekan etarî ye, ticarî ye, doktorî ye, evûqatî ye, yê min jî karê min şoreşgerî ye. Heta ku jimilên min tê, heta ku hilm di qefesa min de hebe, ezê jibo gelê Kurd bixebitim, çî ji min bê ezê bikim. Ku ez ketim jî, ewê yên ji min çêtir ala me pêş ve bibin.

Yên ku wî bi nêzikî naskiribin, hevaltiya wî kiribin, dilsozî, rastgoyî, fedakarî, nefspiçûkî, mêranî û xweşhevaliya wî tu car jî bîr nakin.

Ew şoreşgerêkî jî xelqê bû, ne begzade û şêxzade û ne jî ji yên ku xwe "bîrewer" (entellektuel) dihesibînin bû. Gava ku bawerî bîniya ku hevalekî jê çêtir dizane, xwe pê digirt û carna bi wan re gavên şaş û xelet davêt di rîya nenasa rizgariyê de (tenê yên ku li mala xwe rûdinên tu şaşiya nakin. ▶▶

Yên ku dilivin, dime
 ęin ewê carna ęaęi-
 yan bikin. Şoreşger
 ne ew e ku tu ęaęi-
 yan na ke, ev nemim-
 kine, lê yê ku ęaęi
 yên xwe dibîne û wan
 rast dike) Bi gel-
 lek hevî û xewnan bi
 Dr. Şivan û hevalên
 wî re çûbû Kurdîsta-
 na Îraqê, jibo xebatê.
 Li wir bereber e xwe-
 zaya (tebieta) paşverû-
 yaserokatiya tevgera
 Kurdên Îraqê dîtibû
 û bizorê ji kurtinê
 fîlitibû. Pêlekî li
 Ewrûpayê şarederî ma
 bû, dûre di 1974 an de
 vegeyriyabû Kurdîstanê
 û liwir, gava ku ne di
 gitîgehê de bûna di
 nav qada xebata siya-
 sî de bû. Herwekî pîrr
 xweş zmanê kurdî nas-
 dikir, carna xebata
 çandî jî dikir, hin hel
 bestên şoreşger (yên
 Ahmet Arif, Nazim Hik-
 met, hwd..) jî tirkî
 werdigerand. Wî wisa jî
 "Zewaca Bêdil"ê Smaîlê
 Dûko, jî tîpên rûsî ki-
 ribû kurdîya latînî.
 Muhterem di demekî
 wisa de mir ku ew îndî
 di nav xebatê de pişî-
 ya bû, gihîştibû, têr
 çeliqî bû; rê û dirban,
 merivan naskiribû, bûbû
 xwedî ceribandin û di
 xebata rojana da, di ya
 pratîk de, şoreşgerekî
 bêhempa bû. Ewê hê teze
 biketa 35 saliyê. Bi mî-
 rina wî, sterkekî geşê
 hêviyê jî esmanê Kur-
 dîstanê xuricî.
 Xemgînî û dilkovani-
 ya heval û hogirên wî
 giran e. Ewê tim di bî-
 ra me de be. Ewê tim di
 dilê me de wekî tîrêje
 ke fedakarî, dilsozî, şo-
 reşgerî û mêrxasiyê bi-
 çirise, herûher bijî.

Deng û Alan

LE MONDE: Rojnameya navdar a fransîz di
 hejmara xwe ya 27.7.1978 de bendekt mezî (rû-
 pelekî) li ser rewşa Kurdên Tirkiyê derxist.

Di hejmara 11.8.1978 de bendekt li ser ro-
 mana "Giyayê nemir", ya û peyiveki digel nivîs-
 karê wê Yaşar Kemal derket. Tê de Yaşar Kemal
 dibêje ku dê û bavê wî her dû jî Kurd bûn û
 li malê bi Kurdî xeberdidan. Lê ew bixwe doza
 Kurdîtiyê nake. Rast e ku tro ro, kurdîtt kani-
 ya derd û bela û sergêjahiyane.

● Radiyo ya Fransa çend roj li dû hev li guh
 darên xwe şretkir ku herin rabert (teşîrk) nû
 ya Wênekare (resamê) Kurdê navdar REMZI bibînin.
 Ev raberiya teze, li muzexana bajarê Dourdanê
 di şatoyekt de hatiye vekirin û pîrr raxbet
 dibîne.

ROUGE: Rojname kommunista anvetew-
 yî (enternasyonal) di hejmara xwe ya
 du rûpel cih dide peyivekt digel Gérard Chali-
 and, sekreterê Gîstiyê Komela Fransa-Kurdîstan
 , nivîskar û milîtanê antî-emperyalîst fransîz
 navdar. Tê de (Chaliand qala rewşa niha ya Kur-
 dîstana Îraqê dike. Rouge bi pesindartî jî pîr-
 tûka nû derketî "Les Kurdes et Le Kurdistan"
 Xeber dide û xwedîna wê bi germî li milîtan-
 an şret dike.

● Kongera zmanên hindikahîyan (eqaliyetan)
 di destpêka tebarê de li bajarê katalanî
 Barcelone (Ispanya) giztîrên 18 gelên bindest
 civtîya. Li ser gelê Kurd biryarên (qerarên) çê
 hatin stendin. Rojnameyên Barcelonê, Mundo
 Diario (2.8.1978); Avui (3.8.1978), El Noticiero
 Universal wî yên jibo azadiyê bendinê di-
 rêj û hêja çap kirin.

The Economist, rojnameya ingilîza navdar di
 hejmara xwe ya 24.6.1978, bendekt derxist li
 ser şerên Kurdîstana Îraqê.

BEND Û PIRTÛKEN NÛ

● Les Kurdes et le Kurdistan (Kurd û Kur-
 dîstan): G. Chaliyand, A.R. Ghassem lou, Kendal,
 M. Nazdar, A. Roosevelt, I.C. Vanly.

Pêşgotina prof. M. RODINSON, F. Maspero, Paris,
 1978; 352r. 65 FF.

● Şekirê Xudo; Problema natsiyonalnoy avto-
 nomii kurdskego naroda v Irakskeoy Respub-
 like (rûsî). (Pîrsiyara Xwegeriya-otonomiya-
 neteweyiya xelkê Kurde li komara Îraqê);
 teza doktorya zana û dîroknivîsê me yî hêja
 Şekiroyê Xudo, endamê bêşa kurdî ya Akade-
 mîya Zanîstî ya Ermenîstanê Moskova; 1978.

● Prof. Heciyê Cindî; Şaxên eposa "Rustemê
 Zalê" kurdî. (bi kurdî) Erîwan, 1978.

ÇAPA KURDÎ BIXWÎNE,

pirtûknasi

Va ne navê çend pirtûkên ku di van salên dawîn de li ser Kurd û Kurdîstanê derketine.

● Celîlê CELÎL, Kurdî Osmanskoy Imperii v pervoy polovîne XIX veka (Kurdên Împaratoriya Osmanî di nivê pêşînê sedsala XIXa de) Akademiya Zanistiyên Yekîtiya Komarên Sosyalîstên Sovyetî yê (YKSS), Moskova, 1973, 194r. (bi-rûsî).

● M. Lazarev, Kurdskiy Vopros (Pirsiyara Kurdî). Akademiya Zanisteyên YKSS, Moskova, 1972, 485r. (bi rûsî).

● Basîl NIKITINE. Les Kurdes (Kurd), çapa teze bi destê Komela Fransa-Kurdîstan, Parîs, 1975, 351r (bi fransizî).

● Ismet Şerîf Vanly, Le Kurdistan Irakiên, (Kurdîstana Iraqê). Neuchatel 1970, 418r. (bi fransizî)

● Jürgen Roth. Aufstand in Wilden Kurdistan (Serxwerabûndi Kurdîstana kûvî de), Signal-Verlag, Baden Baden, 1977, 160r. (bi almanî)

● Hans Hauser, Kurdistan, Schicksal eines Volkes (Qedera xelkekî) Langen Müller, München, 1975, 280r. (bi almanî)

● Heinz Gstrein, Volk ohne Anwalt (Gelê bê parasker). Imba / Laetare, Freiburg, 1974, 136r. (bi-almanî).

● Haraldson, Erlender. Med uppreisnar mö num; Kurdistan, 182r. (bi swêdî).

● Aksentijevic, Mirko. Kurdî, Borba za Autonomiju (Kurd, Şerê jibo Otonomiyê) Belgrad. (bi serbî).

● Bibliografiya po Kurdovedeniyu (Pirtûknasiya Kurdizaniyê) ya ku Akademiya Zanîsteyên YKSS çap kiri ye navê 2690 pirtûk û bendên li ser Kurda hatine nvîsîn dide. Moskova, 148r.

● ISK's Kurdish Bibliography, Amsterdam, 656r. navê 9350 bend û pirtûkên ku di çil zmanan de li ser Kurd û Kurdîstan, hatine nvîsan. Adide.

● Pradier, J.O. Les Kurdes, Revolution Silencieuse (Kurd Soreşa bê deng), Bordeaux, 286r. (bi fransizî).

● Schmidt, Dana Adams, Journey Among Brave Men (Ger li nav mîrxasan), Boston, 298r. (bi amerîkani)

● Adamson David. The Kurdish War (Şerê Kurd), London, 216r. (bi inglîzî).

● Ghassemlou A.R. Kurdistan and the Kurds (Kurdîstan û Kurd), Akademiya Zanîsteyên Çekoslovakayê, Praha.

● R. Mauriès. Le Kurdistan ou la Mort (Kurdistan an Neman), Parîs. 236r. (bi fransizî).

Çapa Kurdî

Bi zmanê Kurdî û tîpên latînî bilî Azadî yê tu kovar dernakevin. Va ne navên yên ku bi tîpên din dertên.

● Riya Teze, ji sala 1930 a bi vir de li Erîvanê di heftê de du car derdikeve. 4r. Organa PK a Ermenîstanê.

● Kurdistan, organa PDK a Iranê ji mehê carekî bi tîpên erebî dertê. 4r. (bi çapa farisî jî dertê).

● Bîra nûw; organa Partiya Komunîsta Iraqê, bi tîpên erebî dertê.

Kovarên ku bi çu Zman dertên.

● Rizgarî, bi kurdî-tirkî li Tirkîyê dertê. Hejmara pêşîn di adara 1976 a de derketiye. Heta niha 6 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 130-140 rûpel e.

● Roja Welat, bi kurdî-tirkî li Tirkîyê dertê. Heta niha 8 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 16 rûpel e.

● Kovara Özgürlük Yolû (Riya Azadî) ku hin bîrewerên Kurdên pêşverû ji hezîrana 1975 bi vir de ji mehê carekî derdixin, carna bi kurdî bendan li ser zman û wêje (edebiyatê) çap dike.

BÏDE XWENDÏN Û BÏPARÊZE !

ZMAN

Ferhengok

Zmanê xelkêyê rengîn û zengîn, kurdî hê ne bûye zmanekî zanîs tî; dewlemendîn û pêşvebirina wê divê. Her wekî ku kê m tê xwe din, di xwendegahan de nayê hîn kirin, têde cihêbûnên zaravan he ne. Lewra bi kurdî bendên siyasî nvîsandin û xwendin, di despêkê de piçkî dijwar xuya ye. Hin gotinên ku di bendên me de hatine bikaranîn heye ku ji hin xwendevanan ve nenas bin. FERHENGOK a Jêrîn jibo wan e. Gotinên kurdî bi wergerandina tirkî(t) û frañsî(f) hatine dayîn.

Aborî:(t) iktisat; (f) économie
Arizî:(t) özel; (f) privé
Azadî:(t) özgürlük; (f) liberté
Belavok:(t) bildiri; (f) communiqué
Bêş:(t) vergi; (f) impôt
Civak:(t) toplum; (f) société
Civakî:(t) toplumsal; (f) social
Deryavanî:(t) denizcilik; (f) navigation
Dirav:(t) para; (f) monnaie, argent
Diravgîr:(t) ücretli; (f) salarié
Dîrok:mêjû, tarix (t) tarih; (f) histoire
Enî:(t) cephe; (f) front
Firotîşk:(t) eşya; (f) marchandise
Geşbûnî:(t) gelişme; (f) développement
Gewşîn:(t) özellik; (f) particularité
Girîng:(t) önemli; (f) important
Giştî:(t) genel; (f) général
Gizîr:(t) temsilci; (f) délégué
Hevrayî:(t) ortak; (f) commun
Hevdesazî:(t) örgüt; (f) organisation
Heyok:(t) nesne; (f) objet
Hilberandin:(t) üretmek; (f) produire
Hilberî:(t) ürün; (f) produit
Hilberinî:(t) üretim; (f) production
Hilfir:(t) (f) essort
Karciv:(t) korporasyon; (f) corporation
Kardar:(t) işveren; (f) employeur
Karxwe:(t) patron; (f) patron
Kedxur:(t) sömürücü; (f) exploiteur
Kedxurî:(t) sömürü; (f) exploitation
Kevneperest:

Komava:(t) tutucu; (f) conservateur
Komele:(t) dernek; (f) association
Komik:(t) grup; (f) groupe

Maf:(t) hak; (f) droit
Mêtîngêh:(t) sömürge; (f) colonie
Mêtîngêhparez:(t) sömürgeci; (f) colonialist
Mêtîngêhparezî:(t) sömürgecilik. (f) colonialisme
Mînakî:(t) örneğin; (f) par exemple
Navgîn:(t) araç; (f) moyen
Nijad:(t) ırk; (f) race
Nîşe:(t) not; (f) note
Nûjen:(t) modern; (f) moderne
Paşverû:(t) gerici; (f) réactionnaire
Pêkahî:(t) gerçeklik; (f) réalité
Pêkanîn:(t) gerçekleştirmek; (f) réaliser
Pêşverû:(t) ilerici; (f) progressist
Peywendî:(t) ilişki; (f) relation
Peyweng:(t) alet; (f) outil, instrument
Pîşe:(t) sanat; (f) art
Pîşekar:(t) sanatkar; (f) artiste
Pîşewar:(t) zanaatkar; (f) artisan
Rizgarî:(t) kurtuluş; (f) libération
Semyan:(t) ihtişam; (f) magnificence
Serwebûnî:(t) keşif; (f) découverte
Serwer:(t) egemen; (f) souverain
Serxwebûn:(t) bağımsızlık; (f) indépendance
Suxre:(t) angarya; (f) corvée
Taybetî:(t) özel; (f) particulier
Teşe:(t) biçim; (f) forme
War:(t) alan; (f) domaine
Xwedanî:(t) mülkiyet; (f) propriété
Xweger:(t) özerk; (f) autonome
Xwemeş:(t) otomat; (f) automate
Xweza:(t) doğa; (f) nature

ZMAN-FERHENG:

- Feladet A. Bedir Xan, Roger Les cot, Grammaire Kurde (Gramera Kurdî), Paris, 1970, 372r. (bi fransîzî-Kurdî)
- Kamouran A. Bedîr Khan, Langue-Kurde (Zmanê Kurdî) 253. Paris (bi-fransîzî)
- I. O. Farizov, Russko-Kurdskiy Slovar (Ferhenga rûsî-kurdî), Moskova, 782r. 30.000 gotin.
- Qanatê Kurdo. Ferhenga Kurdî-Rûsî, Moskova, 890r. 34.000 gotin.
- Tawfiq Wahby Bey. Kurdish-English Dictionary. (Ferhenga Kurdî-Inglîzî) London, 180r.
- Joyce Blau. Dictionnaire Kurde, Français-Anglais. (Ferhenga-Kurdî-Fransîzî-Inglîzî). Bruxelles, 263r.

Sinifên serdestên Kurd hem bi gur re dixwin hem jî bi xwedî re şînê dikin. Ev helbista Cegerxwîn li ser vê yekê ye.

ÇONA QUNSI LXANA TIRK GUNEHKARIYE BEGIM.

| | | | |
|------------------|------------------|------------------|-------------------|
| Begim, çûbû kû? | Çûbûm e Heleb. | Çawa te hejand | Hey rêberê kor |
| Îqê te çi bû? | Wîlo bê sebeb. | Her kesê bi hîst | Dengê topa we |
| Bêje begê min, | Çi bêjin canim, | Milet nade ser | Rêç û çopa we |
| Ka we çi kiriye? | Qet ez nizanîm | Navê we ye bes | Remza îstîmar |
| We kes nedî qet? | Çima dipirsî!.. | We miletê Kurd | Siparte neyar |
| Begim xuya ye | Gelek ditirsî. | Lê ne raza ye | Şiyar e millet |
| Çima bitirsîm | Ha ha aferim, | Wî zincîr şikand | Jî dest we derket |
| Li her der karim | Serbest bigerim. | Bi we nayînî | Îdî bawerî |
| Ji kerema xwe | Bêje ezbenî. | Ji dijmin re ew | Qet nabî terî. |
| Şerme bese lo | Bi min dikenî. | Canim bes e lo, | Îdî ez ne Kurd. |
| We qunsil nedî? | Ha! qunsilê Tirk | Raste ne Kurdî | Tu bûye zigurd |
| Belê li we kir | Wî xelat û kurt | Ji xwe ne Kurdî | Hemparê dijmin |
| Bestê xwe da we | Ew destê gemar | Hun miletê Kurd | bihev re dixin |
| Destê ko Extî | Hildaye ser dar | Ezê herim lo | Hişim ne ma ye, |
| Ew destê ko kuşt | Sed wek şex Seîd | Ji bo we gotin | Ne pîr seza ay |
| Zana û gernas | Mêrxas û egîd | Here ez benî | Here ez benî |
| Destê bi xwîna | Kurdan bûye sor | Milet, hemî Kurd | Bi we dikenî. |

Elfabe

Ji salên 1930an bîvir de zmanê kurdê bi tîpên (herfên) latîni tê nivîsandin. Elfabe ya latîni xweş li zmanê me te û ewê bêgûman bibe ya hemî Kurdan. Lê niha jiber sedemên cihê reng piraniya Kurdên Iran û Iraqê tîpên erebî, yên Sovyetistanê jî tîpên rûsî bikartînin. Jibo agahdariya xwendevanan va ne ev her sê elfabe.

| Latîni | Rûst | Erebî | Latîni | Rûst | Erebî |
|--------|------|---------------|--------|------|------------|
| A | А | ا، آ، ت، ع | N | Н | ن |
| B | Б | ب | O | О | و |
| C | Ц | ج | P | П | پ |
| G | Ч | چ | Q | Қ | ق |
| D | Д | د، ذ، ض | R | Р | ر |
| E | Э | ا، ه، و، ع | S | С | س، ص، ش |
| F | Ф | ف، ه، ی، ع | S | Ш | ش |
| F | Ф | ف | T | Т | ت، ط |
| G | Г | گ | U | У | و، ئ |
| H | Н | ه، ح | O | О | و |
| I | И | ا، ح، ه، ی، ع | V | В | ب، ئ |
| I | И | ا، ی، ع | W | W | و |
| J | Ж | ژ | X | Х | خ، غ |
| K | К | ک | Y | У | ی، ئ |
| L | Л | ل | Z | З | و، ذ، ض، ه |
| M | М | م | | | |

KURDÎ BÎXWÎNE, HÎN BÎBE, HÎN BÎKE!..

* Stran û Leylan * *

AZADI, jiho qenc nasîna mûsîkiya kurdî sêlik(nlak) û kasetên bi-qalîte hidest dixê, dadiqre û difroşe. Ji niha ve hun dikarin yêni jêrê binavkirî ji me bixwazin.
-Sêlika kurdî.

Bijarteyên Folklorê-1
Meqamên kevî bi Orkestra nûjen.

Lêdixê Orkestra gelert ya Kurdîstanê.

RÔYÊ A:

&.Dêresorê Piçûkê (Solîst:Zadîna Şekîr).&.Çavreş çavreş bona te (Solîst:Têmûrê Talê).&.Memîr me mir (Solîst:Eyşe Sana Kurdî).&.Heft sal temami hêviya te mam (Bêmalê Keko).&.Lê Pîrê (Solîst Xemoyê Hesên).&.Eman eman Zekiya (Dawidê Xîlo).&.Yar gulê (Solîst Zadîna Şekîr).&.Mala Ximşê (Kom).&.Koçerî (Def û zirne).&.Bihar û Yar (solîst:Aslika Qadir).&.Werdeki golî sor im (Kom).&.Delalamin (Têmûrê Xelîl).

RÔYÊ B:

&.Nar nar narê can (Mecîdê Aslan Zadîna Şakîr).&.Dîlan (Solîst:dawidê Xîlo).&.Nazo (Solîst:Dawidê Xîlo).&.Hey Narê (Solîst:O.Bedelî).&.Ha Gulazer (Solîst:O.Bedelî).&.Hoy Nazê (Solîst:O.Bedelî).&.Tîrîngî (Def û Zirne).&.Romani (Solîst:O.Bedelî).&.Melf (Solîst: Dawidê Xîlê).&.Yar wele keçik e (Aslika Qadir).&.Welatê me Kurdistan e (Solîst:Aslika Qadir).&.Sarê rabe êvar e (Solîst:Aslika Qadir).&.Naziyê lênaziyê (Xelîlê Evdile).

Bijarteyên Folklorê-2
Kulamên Dîlan-1

RÔYÊ A:

&.Xezalê (Semoyê Hesên).&.Bêriwanê (Efoyê Esed).&.Eyşanê (Celîla Çawûş).&.Bavê Seyro (Eyşe Sana Kurdî).&.Lawikê Metînî (Gerêbête Xaço).&.Çiya Bilindin, te nabînim (S.Egît).&.Hekîmo (Sero yê Bro).&.Lê Lê Bêmalê (H.Huseyin).&.Xozanê (Reşîdê Baso).&.Lê lê Ximşê (Kom).

RÔYÊ B:

&.Miho (Fatma Îsa).&.Siyamend û Xecê (Egîtê Têcir).&.Şev tev çû ye (Aram).&.Hesenîko (E.Têcir).&.Apo (Seyadê Semdîn).&.Ereb Şênî (Dawidê Xîlo).&.Lo lo Lawîko (Perîxzn).&.Eman eman Zekiya (Dawidê Xîlo).&.Welatê me Kurdistan e (Kom, Solîst:Aslika Qadir).

Bijarteyên Folklorê-3
Kulamên Dîlan-2 (Stranên Evînê)

RÔYÊ A:

&.Kalo (Dawidê Xîlo).&.Lê lê Bêriwanê (E.Esed).&.Bedewê (Seroyê Bro).&.Edûlê (G.Xaço).&.Şewabê (S.Bro).&.Seyranê Mûsa (Reşîtê Baso).&.Xezalê lê (Mîrzê Egît).&.Bavê Fexriya (M.Bavê).

RÔYÊ B:

&.Ehmedo Ronî (Mihemedê Mûsa).&.Evdilê Eyşê (G.Xaço).&.Dayikê (G.Xaço).&.Gidî lolo (S.Semdîn).&.Qîza Kurda (Aram).&.Hey Gulînê (Aram).&.Aylê Xezalê (S.Îzol).&.Lo lo gidî (Beyda Qado);&.Welatê me Kurdistan e (Kom, Solîst:Aslika Qadir).

Bijarteyên Folklorê-4
Kulamên Siyaran (Stranên Şeran)

RÔYÊ A:

&.Sîlêmanê Mistê (G.Xaço).&.Metê (S.Bro).&.Bişaro lo lawo (Memoyê Silo).&.Lê Wayê (Cemîlê Çeto).&.Lo Bavo (Kezîzera Xelo).&.Heyla Mîro (Reşîtê Baso).&.Fîlîtê Quto (Eliyê Hemed).&.Cîrîd (Samilê Beko).

RÔYÊ B:

Sîsîlê (Memoyê Silo).&.Keir û Kulîk (Egîtê Têcir).&.De Wêlî Ehmedo Bra (Seroyê Bro).&.Were wî lo lo (Efoyê Esed).&.Dînyayê (Reşîdê Baso).&.Eyşanê (Mehemedê Xîlo).&.Welatê me Kurdistan e (Kom, Solîst Aslika Qadir).

Bijarteyên Folklorê-5
Blûr, Fîq (Dûdûk)

Fîq (Dûdûk): Egîtê Gîmo
Blûr: Şamilê Beko
Piyano: Cemîla Celîl

ROYÊ A:

Bavê Seyro / Qeydên nêriya / Deyoyo
Siyabend û Xecê.

ROYÊ B:

Êvarên havînê / Qeydên Sivanan /
Gulê Mehrûmê / Kerr û Kulik / Welatê
Kurda / Bêrivanê / Xozanê / Welatê me
Kurdistan e.

Bijarteyên Folklorê-6
Def, Zirne û Fîq (Dûdûk)

Xelîlê Evdile - Şamilê Beko -
Egîtê Cîmo.

ROYÊ A:

Ha berde berde / trîngî / Qeydên
dilan û govendê / Cîrîd / Girêşîra
bi sir e.

ROYÊ B:

Gava zerya min nişan kirin / Koçe
rî / Naziyê lê naziyê / Welatê
Kurda tev xêr û bêr e / Welatê me
Kurdistan e.

Bijaretyên Wêjeya Klasîk-7
Beyt / qesîde / helbest. 1

Distirê û dibêje

ROYÊ A:

Şexê Zirav

8. Soxû şengê (Melayê Cizirî). & Xaki
Kurdistan (Cegerxwîn). & Şerbeta lam
û beyanê (Melayê Cizirî). & Îro ji
derba Xencerê (Melayê Cizirî). & Xe-
ma eşqê perîtim ez (Melayê Cizirî).
Ey bilbilê Dilşadî
Dilê Mermîn
Mey nenoşî (Melayê Cizirî). & Yek bû
se da min bi sed qiyamet (Melayê Ci-
zirî).

ROYÊ B:

8. Jîbo Melayê Cizirî (Şex. E. Rehmî)
& Fesl û Bihara Cenetê (Feqiyê Fey-
ran). & Dilberek min di di xewda
(Melayê Batê). & Ey Felek (Siyapoş).

Min qebûl e xemr û saqî (Siyapoş).
& Dil yek e dilber hezar in (...).
& Welatê min tu yî Bûka cihanî
(Cegerxwîn). & Ey Welat boç perçe,
perçe (Cegerxwîn). & Kufregeha axê
(Cegerxwîn). & Ronahî li pey tarî ye
(Cegerxwîn). & Sed sal e em şerpeze
li pey şêx û bega ne (Cegerxwîn). & Ren-
gê Xezalan (Cegerxwîn). & Welatê me
Kurdistan e. (Kom, Solist: Aslîka Qadir)

Dengbêjên hemdem-1

ARAM.

ROYÊ A:

& Wextê Zerya min nişan kirin. & Gu-
lîstanê. & Tûzik. & Kula dilê min Welat
& Sing û berê kewa gozel. & Lê lê hanê
& Qîza Kurda. & Gulgulî ha gulgulî. &
Ha Hulînê.

ROYÊ B:

& Sev tev çûye. & Yar tu were, & Almas-
ta min. & Qîmet delalîya min biya. &
Qîza Kurda. & Lo lo pismam. & Cahilno
& Hem degbêjim, hem sazband im. & Bisk
bi têl. & Ay dil.



Musique Populaire du Kurdistan
(Mûstîkiya Geleriya Kurdistanê)
Chants d'Amour - Stranên Evînê
Distirên: Aramê Tigran, Aslîka
Qadir, Gerabêtê Xaço, Şeroyê Bro,
Temo, Zafîna Şekir, hwd...

Sêlik=33 ger, 7 Dollar, 15 DM

Kaset=60 deq, dom dike, 5 Dol-
lar, 10 DM (şandin tê de)

* Stran û Leylan * *

NÎNIK NÎNAÊ TEME

CEMÎLA CELÎL

Allegro

Nî - nik Nî - na - ê te - me,
Ç'e'v - reş mê - va - nê te - me.

ha, ha, ha, Nî - no, Nî - no. Nî - no.

Nînik Nînaê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Ç'e'vîreş mêvanê teme, ha, ha, ha, Nîno.
Nîno. Nîno, Nîno, Nîno.

Sibê ser rêka xweme, ha, ha, ha, Nîno,
Dusibê cînarê teme, ha, ha, ha, Nîno,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

Aşiqê bejna teme, ha, ha, ha, Nîno,
Deqa ser sîngê teme, ha, ha, ha, Nîno,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

Bazinê destê teme, ha, ha, ha, Nîno,
Gustîlka t'ilya teme, ha, ha, ha, Nîno,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno.

NETEWYEKÎ KU LI
YEKÎ DIN ZORDESTIYÊ
DIKE, BXWE JÎ NE
A Z A D Ê!
Karl MARX

JIBO GELEKÎ BINDEST
ENTERNASYONALÎZM XWE
JÎ NÎRÊ EMPERYALÎZM
Û ZORDESTIYA NETEWYÊ
RIZGAR KIRIN, WELATEKÎ
AZA, SERXWE Û SOSYALÎST
AVA KIRIN E,

LENÎN DIBÊJE:

ÇAWA MIROVATÎ NIKARE BIGHÊ WINDA-
BÛNA SINIFAN (ÇÎNAN) BÊY GEHÎNEKA
(SAFHA) DERBAŞÎ YA DÎKTATORÎ YA
SINIFA BINDEST, WISA JÎ EW NIKARE
BIGHÊ TEVHEVIYA NAYEREVÎN (MIQEDER)
A NETEWAYAN (MILETAN) TA KU EW DEMA
DERBASOKA RIZGARÎ YA TEMAMIYA HE-
MÎ NETEWYÊN BINDEST AZADIYA XWE
YA CIHÊ BÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST
NEXIN.

Oeuvres (afirandin), c. 22, r. 159

HEJMARA KU TÊ :

- Ji Daxuyaniya Partiya Komunîst
- Ji Bingehên destpêkiyên feşefê
- Li ser şerê hindurê Kurdên Iraqê
- Pirsa AKSA yê
- Xebata Yekîtiya Xwendekarên
Kurdîstanê li Fransa
- Pirsa Yekîtiya Nîştîmanî
- Ji Dîroka Kurdîstanê, hwd...hwd...

A Z A D Î

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ

Jibo nêzîkbûyîna hêz, bêşok û
komikên şoreşger û welatparê-
zên Kurdîstanê dixebite.

*Bi arîkariya komekî Xebatkar û
Xwendekarên Kurd derdikeve. Bi
tu partî û hevdesaziyên tu per-
çeyekî Kurdîstanê ve negirêda-
yt ye.*

Berpirsiyarê gîştî: K e n d a l
Berpirsiyarê malhebûnê: H. KARACA
Nvîsekarî : E B D O

Navnîşan : Kovara A Z A D Î
B.P. 378 75625
PARIS CEDEX 13
France

Dirav (pêre) Ii ser navnîşana
A Z A D Î CCP n°. 23 37 449 L
Parîs/France

KURDÎSTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST!